

Îran rêkhev-
tina Etomî naxwaze
bombeyê dixwaze!

»»» R:7



Bivirê “Centcom”ê
bo şikandina maziya
pişta Îranê ye

»»» R:4



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (393) 06-03-2021 Buha (1000) Tûmen

Paraştina mîrata
çandî, qahîmkirina
xîmê nasnameya çandî
ye

»»» R:5



Kolberî diyariyeke
reş a dagîrkeran bo
Kurdan

»»» R:6



Agirbaran di Rojhilata Navîn de

Sibêdeha roja Çarşemî rêkevta 13'ê Reşeme, binkeya leşkerî ya “Eyn El-Esed” li parêzgeha “Enbar” a Îraqê ku mana cihê komek ji hêzên leşkerî yên Amerîkayê ye, bû bi armanca 10 mûşekan yên ji cora “Ares”, ku bi wê sedemê peymank-arekî medenî canê xwe ji deşt da. Eva sêhemîn haletên hevşêwe ne ku li çend hefteyên derbasbûyî de mirina kes yan kesnakê li pey xwe aniye.

Berê jî di detspêka meha Reşeme û dawiya meha Rêbendanê de êrişek bi vî awayî li ser Hewlêra paytexa Herêma Kurdistanê hate kirin. Êrişa vê carê ya bersiva kuştina 22 kes ji çekdarên “Ketaîba Hizbullah” a ser bi Komara Îslamî bû ku hefteya derbasbûyî ji aliyê Amerîkayê ve hati-bûne kuştin.

Ew bûyere hevdem bû digel belavbûna îtirafa çekdarekî ser bi gurdanên “Ketaîba Seydullûheda” ku girûpeke çekdar a Îraqê a ser bi Komara Îslamî ye. Ew kes ku navê wî “Heyder Elbeyatî” ye ragihandiye: Êriş bo ser balafirxaneyê Hew-



lêrê li 27'ê Rêbendan û herwisa êriş bo ser hêzên hevpeymanîya dijî DAÎŞê bi serkirdayetîya Amerîka li “Eyn El-Esed” ji aliyê gurdana Ketaîb û bi pîlana Tehranê hatiye kirin. Navbirî îtirafa vê jî kiriye ku veguhasîna wan êrişan ji aliyê Komara Îslamî ve bûye.

Hevdem Artêşa Sûriyê sibêdeha roja Yekşemiyê 10'ê Reşem ragihand, ku Îsraîlê çend cihek li başûrê Demişqê kiriye bi armanca êrişa rakêtên xwe.

Pêka daxuyaniya Artêşa Sûriyê, ew êrişe li bilindahiyên “Golan”ê hatiye encamdan û

dijemûşekiyên Sûriyê karîne bersiva wê êrişê bidin û parek ji wan rakêtan di esman de bike armanc.

Ji aliyeke din ve, çavkaniyên Îsraîlî dane zanîn, ew êrişên ku li ser binkeyên milîsên girêdayê rejîma Îranê hatine kirin û ew kirine armanc, beşek ji bersiva Îsraîlê li derheq êrişa li ser gemiya Îsraîlê ye.

Berê jî Îsraîlê ragihandibû ku belgeyên tewaw ji ber deşt de hene ku dide xuya, rejîma Îranê li êrişa li ser gemiya Îsraîlî di deryaya Emmanê de rol hebûye. Wezîrê Berevanî yê Îsraîlê, “Benny Gantz” gotibû: “Berevirdên

deştpekî didin xuya ku Îran berpirsyarê êriş li ser wê gemiyê ye ku li roja Pêncşemîya derbasbûyî raştî teqînê hatibû.

Ji aliyeke din ve Serokwezîrê Îsraîl, “Benjamin Netanyahu” di hevpeyvînekê de digel “Fox News” ku li 14'ê Reşeme belav bibû, ragihandiye: “Ez wekî Serokwezîrê take welatê Cihû, îznê nadim ku taqimeke axûnd me li ser rûkê erdê rakin. Gotinên Navbirî hevdem digel belavbûna hin raporên e ku li derheq hewlên Amerîka bona deştpekîrîna danûstandin li ser bernameya navkî digel Tehranê ye.

Wezîrê Berevanî yê Îsraîlê jî gotiye: “Arteşa wî welatî bi dom li halê xweamadekirin di hember gef û metirsiyên Komara Îslamî de ye û hekî civaka navnetewî li derheq bernameya navkiya Îranê pêngaveke alxahînkêr neavêje, Îsraîl dê yekalî li ser bixebite û ewlehiya xwe biparêze.

Pêka raporekê ku “Fox News”ê belav kiriye, Îsraîlê komek berçav ji armanc di Îranê de diyarî kiriye ku li hegera berdewambûna Tehranê li ser helwestên xwe yên berê wan dike bi armanc. Ew çavkaniya nûçeyî bas ji vê yekê dike ku Komara Îslamî di sala nû de û ji rêya hin girûpên girêdayê bi xwe ve li Sûriyê û Lubnanê li dijî Îsraîlê hereketên leşkerî dike.

Ragihandinên navxweyî yên Îsraîlê jî ragihandine ku hekî şer di navbera Îsraîl û girûpên çekdar yên ser bi Îranê li Lubnan û bi rohnî Hizbullah Lubnanê de bê gorê, rojane “Talaviv” 3 hezar armanc di Lubnanê de ji nav dibe, çimkî tev planên Hizbullah Lubnanê kevtine deştê hêzên Ewlehî yên Îsraîlê de.

Sergotar

Xweamadekirin bo teslîmbûnê



N: Kerîm Perwîzî

Her ji naverasta Havînê ve navendên hizrî û lêkolînî bo wan rohn bibû ku “Donald Trump” û Komarîxwaz hilbijartina serokayetiya Amerîkayê derdidin û Serokê paşerojê dê “Biden” be. Welatên cîhanê jî xwe bo dewra piştî “Donald Trump” amade dikirin û nemaze Ewropayîyan gelek girîngî bi lêdwan û axavtinên “Trump” nedidan û mijûlê amadekarî bo piştî “Donald Trump” bûn.

Lê Komara Îslamî bi awayek din xwe bo piştî “Donald Trump” amade dikir ku li tev siyaseta û têngihîştinên mirovayeti cudadir bû!

Rejîma Komara Îslamî dizanî ku hatina serkar a her dewleteke Demokrat bi wateya vê nîne ku tev deriyekê ber bi wê ve vekin û tev dorpêçan rakin, belkî vêdebirina dorpêçan dixine nav lîsteyên danûstandinan, lewma hewcehiya wê bi vê yekê hebû ku bi destê pir ve!! Here derwanên piştî “Donald Trump” û ser maseya civînê, her lewma givaş, gef û aloziyên xwe di deverê de zêdetir kir û pêngavên xwe yên li dijî yasa û rêkvevtina di warê navkî de tundtir kir û heta mêtala Oraniyoma xwe jî berhem anî ku tenê bo çeka navkî nebe bo çi tiştek din bikar nayê.

Ev bo ser maseya civîn û danûstandinê bûn da ku li dema teslîmbûn bi Amerîka û Ewropaya ku cardin ji hev nêzik bûne, hin puanan werbigre.

Lê hem Ewropa û Amerîka-



mercên zêdetir bi ser de disepînin û hem jî dinya guherî ye. Komara Îslamî tê neçarkirin li hin beşên din de paşekêşeyê bike û di raştî de dibe here li ser maseya teslîmbûnê, lê ew teslîmbûna bi cîhanê, di demekê de ye ku sedan milyar Dolar zîrar gihandiye xelk û aboriya Îranê û tev welat kavi kiriyê û teslîmbûna wê ya direngdem, gelek pirsyaran di navxwe de diafirîne.

Ew pirsyarên mezin ku di nav xelkê Îran û netewên sitemlêkirî de têne afirandin, ev jî rejîmê ditirsînin û rejîm jî bo pêşgirtin bi wan pirsyarane û tirs ji keliyana civatgehê di paşerojê de, di çend mehan pêş de dest avêtiye bi serkut û tepeseriya xelkê li carên berê zêdetir û di nav neteweya Ereb û li Belûçîstan û li Kurdiştanê bi awayekî hîrbûyî ve reftarê dike.

Komara Îslamî her wek Havîna 1367`an a Rojî ku teslîmê mercên Netewên Yekgirî bibû, di navxwe de dest avêt bi kuştina girtiyên siyasî, û di niha de jî ku xwe bo teslîmbûn bi dinyaya derve amade dike, amadebûnên xwe di navxwe de bi vê dizane ku hem xelkê zêdetir serkut bike û hem xwe yekdeştir bike.

Lê ya Komara Îslamî lê tê negihîştîye eva ye ku ne cîhan û dever li rewşa rêkvevtina Brecomê de ne û teslîmbûneke din lê dixwazin, hem jî rewşa nav Îranê û di nav netewên Îranê de wekî serdemê sala 1367`an nîne û civatgeh bi tundî mijûl e ku dikele!

Navenda Hevkarî cinayetên wê dawiyê yên rejîmê li Belûçistanê şermezar kir

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê derheq bûyerên bajarê Serawanê, di daxuyaniyekê de daye zanîn ku sedemên tev kavilkariya Îranê, rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye û herifîna wê rejîmê tenê rêyek e li hember tev xelkê Îranê.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê derheq cinayetên rejîmê di deverên sînori yên Serwana Belûçistanê de

Pêka nûçeya gihîştî me, mixabin hêzên sînori yên Spaha Pasdaran, îro Duşemî 4'ê Reşemeya 1399'an a Rojî, li ser sînore Serawanê kasibkarên bêpenah yên Belûç dane ber gulleyan û di encama wê gullereşanê de nêzî 14 kes hatine kuştin û birîndarkirin.

Eva yekem car nîne ku hêzên Komara Îslamî cinayetên wiha dikin û em bi rojane şahidê cinayetên li pey hev yên rejîmê li Kurdiştanê û



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

deverên din ên netewên xeyrefars bûne û eva bûye karê rojane yê rejîmê.

Rewşa tirajîdiya deverên netewên xeyrefars û nebûna derfeta kar û bêparkirina wan her berdewam e û eva bûye sedem ku netewên bindest û xelkê bêhêvî yên wan deveran bo peydakirina nanê şevê ber bi karên sînori ve herin û canê xwe bixine metirsiyê.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê tevî şermezerkirina wê cinayeta rejîma dijemirovî, sersaxiyê dibêje malbatên canjidestdayên wê cinayetê û em hêvî dikin ku birîndar jî bi zûtirîn dem bêne tedavîkirin, em li ser wê bawerê ne ku sedemên tev kavilkariya Îranê, rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye û herifîna wê rejîmê tenê rêyek e li hember wê xelkê.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê

4'ê Reşemeya 1399'an a rojî

23'ê Şibata 2021'an

Li fêrgeha Serwan “Çeko” desteyek ji ciwanên welatparêz tevî Hêza Pêşmergê Kurdiştanê bûn

Roja Yekşemî 10ê Reçeme (28ê Şibat)ê, rêûresma bi dawîhatina dewreya 247 a destpêkî ya Hêza Pêşmergê Kurdiştanê di çiyayên Kurdiştanê de bi rê ve çû.

Di wê rêûresmê de, hejmarek ji endamên rêberayeti, fermanandên leşkerî, kadr, pêşmerge û mêwanan amade bûn. Rêûresm bi sirûda netewî ya “Ey Reqîb” û ragirtine xulek bédengî bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdiştanê dest pêkir.

Piştê beşdarbûyên dewrê bi encamdana rêja leşkerî û nîşandana hin nimayîşan di heyamê dewrê de ku hîn bibûn, amadebûna ceştyî û leşkeriya xwe dane xuya.

Piştê berpîrsê “Dezgeha Hilbijartina PDKÎ”, “Selîm Zencîrî” çend gotinek bi wê hilkeftê pêşkêşî beşdarbûyên rêûresmê kir. Di doma rêûresmê de, peyama Fêrgeha Fermandeyiya Hêza



Pêşmergê Kurdiştanê, ji aliyê “Xelîl Gulûkanlû Mîlan” ve hate pêkêşkirin.

Peyma dewreya 247 a destpêkî ya pêşmerge, ji aliyê beşdarbûyê dewrê, “Yezdan Ferehmend” ve hate pêkêşkirin. Ew dewre jî wekî dewreyên berê, ji 2 beşên siyasî û leşkerî pêk hatibû.

Di wê dewreyê de, kesên serketî yên beşa siyasî û leşkerî, hatine xelatkirin

Li beşa siyasî û leşkerî:

Pileye yekem: “Aso Esedî”

Pileya Duyem: “Muîn Bazanî”

Pileya Sêyem: “Ako Elîzade”

Evên ku xelat bideştve anîbûn ji aliyê “Luqman Ebdullazade” ve ku yek ji fermandeyên “Hêza Pêşmergên Kurdiştanê” ye, xelatên wan hate pêkêşkirin.

Di beşa dîsîplîn de:

Pileya yekem: “Dîlan Kerîmî”

Pileya Duyem: “Murteza Yegane”

Pileya Sêyem: “Îsa Xalidî”

Evên ku xelat bideştve anîbûn ji aliyê berpîrsê Fêrgeha Fermandehiyê ya Hêza Pêşmergên Kurdiştanê “Muxtar Sohrabî” ve hatine xelatkirin.

Di dawiyê de, beşdarbûyên dewrê manoreke leşkerî û şerê takekesî lidar xistin.

Bivirê “Centcom”ê bo şikandina maziya piştta Îranê ye



N: Serbest Urmiye

Piştî derketina Bihara Erebî û serhildanên azadîxwaziyê di Sûriyê de, derfeteke din kete destê rejîma Îranê ku bi hêceta paraştina desthilata Beşar Esed û hikûmeta Beis li wî welatî, siyasetên şerxwazî yên xwe derbasî qunaxeke din bike û korîdora xwe ya Şîie, hindek din dirêj û berfirehtir bike. Bi xasma ku niha rêya Îraqê jê re wala ye û dikare di wê rêyê de him bi pirsgirêkên kêmtir ji caran derbasî Sûriya û Lubnanê bibe û him jî bikeve bin guhê Îsraîlê ku ji mêj ve ye dirûşma ji holê rakirina wê dide.

Serhildana Bihara Erebî di Sûriyê de, derfetek din da destê rejîma Îranê ku bi damezirandina bingeh û cibilxaneyên leşkerî, him piştevaniya dar û destekên xwe yên herêmê, nemaze hêzên weke Hamas, Hizbullah Lubnanê û ... hwd di heremê de bike û him jî gefê li tenahiya Îsraîlê û hevalbendên Ereb yên Emerîkayê bike. Li gor şiroveya “Michael Herzog” qumandarê berê yê Arteşa Îsraîlê, çeperên rejîma Îranê di Sûriyê de xwe li çeperên wê li Lubnanê de dide ku berê hatibîn damezirandin. Di vê rêyê de Hizbullah Lubnanê kariye cibilxaneyêke bihêz a leşkerî ji Îranê werbigire ku li gor texmîn û zaniyariyên dezgehên ewlekariya Îsraîlê, pitirî 130 hezar mûşek û xompareyan dibin. Herwiha Îranê hewil daye ku bi alîkariya dar û destekên xwe yên wê herêmê, tûnelên dûr û dirêj li nezîk sînorên Îsraîlê bikole ku di hegera serhildana şer di navbera Îran û Îsraîlê de, bikare di rêya wan tûnelan de bi hezaran



leşkerên xwe derbasî axa Îsraîlê bike. Di vê derheqê de jî Hizbullah, rola sereke digêre.

“Michael Herzog” ji aliyêke din ve wiha dibêje ku niha Arteşa Îsraîlê xwe bi şerê sêyemîn a Lubnanê ku weke doma şerên çekdarî yên 1982 heya 2006`an ve mijûl nake, belkî qala hegera serhildana “şerê bakur” dike ku Arteşa Îsraîlê di eniyêke berfirehtir de rûyê şer ber bi sînorên Sûriya û Lubnanê ve dibe. Eniyek ku ji aliyê kereşte û cibilxaneyê pêşkevî ya şer ve bihêz e. Herwiha ew li ser wê baweriyê ye ku alîgiriya rejîma Îranê li Sûriyê, dibe ku gefê li Urdirê jî bixwe. Urdirê yek ji wan welatan e ku gelek caran ji ber piştevaniyê ji Îsraîlê, ketiye ber rexne û gefên Îranê, lewma paraştin û ewlehiya wê ji Îsraîlê re girîng e.

Hêla sor a Îsraîlê li hember Îranê

Di salên borî de hewil û kiriyarên rejîma Îranê di rêya hêza Spaha Qudis û taqimên ser bi wê yên korîdora Şîe de li dijî tenahiya Îsraîlê û nemaze mûşekbarankirina axa Îsraîlê û bingehên leşkerî yên wê di nava sînorên Îsraîlê de, bûne sedem ku Îsraîl helwestên xwe bo paraştina ewlehiya xwe tundtir bike û hêla xwe ya sor li hember

kiriyarên şerajo yên Îranê de berfirehtir bike. Piştî vê çendê jî ji bilî Hizbullah Lubnanê, Arteşa Îsraîlê erîşên xwe li ser bingehên leşkerî û cibilxaneyên Îranê di nava axa Sûriyê de dest pêkir. Di vê derheqê de Arteşa Îsraîlê heya niha kariye serkevtinê bi dest xwe ve bîne. Bi awayekê ku rayedarên leşkerî yên Arteşa Îsraîlê îdia dikin ku karîne pêşiya berfirehbûna kiriyar û siyasetên şerxwazî yên Îranê astengiyan çêbikin û heya qasekê hegera serhildana şer lawaz bikin. Lê dîsan serbarê vê hindê jî hêsta rejîma Îranê dest ji kiriyarên xwe yên şerxwazî, nemaze di nava axa Sûriyê de û li dijî tenahiya Îsraîlê û hevalbendên Ereb yên Emerîkayê bernedaye.

“CENTCOM” çekeke din ji destê Îsraîlê de

Di raştî de derbaskirina Îsraîlê bo navenda “CENTCOM”ê de, pêngaveke din e ji bo xurtkirin û biheztirkirina alîkariyên herêmî û heya qasekê ji cîhanî bo kontrolkirina siyasetên navkî û şerxwaziyên Îranê. Li gor şiroveyan him Îsraîlê û him jî dewletên Ereb ên dijberî Îranê, pitir çavnihêrê siyasetên Emerîkayê di heyamê serokatîya “Donald Trump” de bûn, ji bo lihemberderketin li dijî Îranê, lê wî hewil

da ku ji vê yekê weke karteke piştevaniyê bo serkevtina xwe bo gerreke din a serokatîyê mifahê wergire. Piştî bêhêvîbûna “Donald Trump” ji gerra duyemîn a serokatîya Emerîkayî, wî hewil da ku serokatîya nû raştî lêgereke cidî bike û neçar bike ku heya qasekê siyasetên serokatîya wî bidomîne. Derbaskirina dewleta Îsraîlê bo navenda fermandariya Rojhilata Navîn, rojhilatê Efrîqayê û herêma Asiaya Navîn ya Arteşa Emerîkayê “CENTCOM”ê, serokatîya nû hevalbendên herêmî û cîhanî yên wê neçar dike di hegera serhildana şer li dijî Îsraîlê yan hewildan li dijî tenahiya wî welatî, pêre piştevan û alîkar bin.

Li gor vê biriyayê û yasaya “CENTCOM”ê, Îsraîl mafê vê yekê heye ku çi dema ku şer di navbera Îran û Îsraîlê de serhilda, hewcehî û alîkariyên xwe yên leşkerî û ewlekariyê, him ji hêzên Emerîkayê yên herêmê û him jî hevalbendên wê, dabîn bikin. Ev yeka jî weke karteke zextê li dijî rejîma Îranê dikeve destê Îsraîlê û topê diavêje meydana rejîma Îranê, ka gelo dê desta ji siyasetên xwe yên şerxwazî û terorîstî berde, yan dê piştta xwe di şereke tevalî de biçemîne?

Parastina mîrata çandî, qahîmkirina xîmê nasnameya çandî ye



N: Bêhzad Qadirî

Yek ji çalêncên sereke yên welatên di halê geşeyê de, lawaziya “nasnameya çandî” ya takên civatgehê ye li hemberderketin digel çanda bîhanî ya welatên pêşkevî. Di piraniya welatên di halê geşeyê de, li hemberderketin digel çanda bîhaniyan, unsûrên çandî yên netewî ji nav diçin yan lawaz dibin û unsûlên çandî yên nû bi hêsanî tene cihgirkirin. Bi balkişandin bi vê ku parastina nasnameya çandî piştewaniya serke ya çanda civatgehê ye û lawazî û jinavçûna wê dibe sedema bê nasnameya takên civatgehê, parastina wê nasnamê û unsûlên çandî girîng û hewce ye.

“Nasname” pêwendiya rastevxwe bi têngihîştina xelkê ve heye ku “kê” ne û “çî” ne û çî tiştê bo girîng e. Ev têngihîştine jî teybetbemendî ne ku dibe sedema vê ku kesek li kesek din, civatek li civatek din û neteweyek li neteweyek din cuta be.

Çemka “çand” yek ji aloz-tirîn çemkan ye ku li zaništa civatî de mifahê jê werdigrin. “Edward Taylor” li sala 1871`î de bi vî awayî li ser çandê dibêje: “Çand çamkeke aloz e ku bawer, huner, exlaq, dab û nerît û reftar ji xwe digre ku wekî enamek civatgehê, ji civatgeha xwe hîn dibe û di hember heman civatgehê de hin erkan digre stuyê xwe.

Her girûpeke civakî ya xwedî dîrok, şeweya aborî, bîr û bawer, ziman û wêje û hunera taybet bi xwe ye. Ev taybetmendiyane ku çanda civatgehê ji civatgehên din



cuda dike, bas ji pênaseya çanda wê civatgehê dike. Bi watayek din dîrok, hemase, melbend, zimanê dayîkî, baweran, dab û nerît, şanaziyên netewî û huner û wêje, nasnameya çandî ya civatgehekê pêk tînin. Her civatgehek li hemû cihekê û hemû demekê de, li ser resenayetiya nasnameya çandî ya xwe tekez dike û tédikoşe ku bi hêz û xirûr ve, taybetmendiyên wê nasnamê zîndî rabigre û berevaniyê jê bike.

Herwa ku hate gotin, “dîrok” yek ji pêkhênerê nasnameya çandî ye. Di vê navberê de, “mîrata çandî û şûnwarên dîrokî” bi tev rehendên xwe ve parek in ji dîrok. Cîhan pîre ji mîrat û şûnwarên kevin; Gelek ji gund û bajar, çend avahî yan cihên dîrokî, yan dab û nerîteke mehêlî hene û parastina wan dibe sedema pêwendiya rûniştîyên wan cihan digel derbasbûya xwe. Ji aliyek din ve ew mîrat û şûnwaranane ku mozexwane, avahiyên dîrokî û cihên geştyarî ji xwe digre, beşek in ji mîrata navnetewî û dikarin bala hemû dinyayê ji aliyê xwe ve rabikêşin. “Mîrata çandî” wek samaneke çandî, pêkhatiye ji: “Avahiyên, cih, dever, ber-

hemên hunerî wekî nîgar û peykeran û...”. Konvansiyoona “Yûnêsko” li sala 1972`î de, ew mînakane wekî mîrata çandî daye nasîn:

1- Avahiyên yadigarî: Berhema mêmari, berhema mezin a peykersazî, nîgara mezin, berhema xwediyê taybetmendiyê şûnwarên ku xwediyê nirxeke cîhanî ya zêde ye.

2- Komek ji avahiyên: Girûpek ji avahiyên cuda yan bi hev re hatine girêdan, bi boneya şewaza mêmari yan şewaza tevîhev yan cihê hilkevtiya wan.

3- Berhemên mirov yan berhemên mirov û surûşt.

Her civatgeheke xwedî dîrok, dab û nerît, baweran, edebiyat, huner û berhemên taybet bi xwe ye ku wê civatgehê ji civatgehên din cuda dike û “nasnameya çandî” ya wê civatgehê pêk tîne. Her dem yek ji wan xalane li neteweyekê yan takekê de nebe yan lawaz be, nasnameya çandî ya wê gelê rastî kêmûkurî û ziyane tê û eva rohn e ku civatgehek nasnameya wê ya çandî bihêz nebe, bi asayî amadeya wergirtina her core unsûleke çandîya neteweyeke

din e û pirojeya asmîlasyonê bi hêsanî bi ser de dadibeze.

Li hemberderketin li dijî diyardeya “bi cîhanîbûn” eva ku girîng e, parastin û geşeyê û bihêztirkirina nasnameya çandî ya civatgehê ye. Di vê navberê de berevanî û parastina mîrata dîrokî û şûnwarên kevin, rola sereke dilîze. Neteweyek ku pêşîneya netewî û çandîya xwe ji deşt dabe, civatgeheke lawaz û ziyanderketî ye û bi hêsanî tê hilûşîn. Nasîn, parastin û bihêzkirina nasnameya çandî, dibe sedema xwenasî û zivirîn bo resenayetiya me û nahêle rastî “bîhanîbûn ji netewê” bin.

Di vê derheqê de erkê me çî ye?

1- Zîndîragirtin û balkêşandin bi mîrata çandî

2- Parastin û nojenkirina şûnwarên dîrokî

3- Berfirehkirin bi geştyariya dîrokî

4- Danana mozexane û komkirina kereştîyên dîrokî yên Kurdiştanê

Kolberî diyariyeke reş a dagîrkeran bo Kurdan



N: Homan Simko

Kolberî yek ji diyardeyên nû li deverên sînorî yên Rojhilatê Kurdistanê ye, kolber di deverên sînorî de kelûpelan bi rêyên asê û pir zehmet ji çiyayan re bi piştta xwe derbas dikin û vediguhazin. Kolberî wekî kar an kasib-kariyek li deverên sînorî yên Rojhilatê Kurdistanê, bûye kareke berfirh.

Tevî hebûna şiyar û derfetên cur bi cur di wan deveran de, bi hegera geşenekirin û nebûna jêrxanên bingehîn yên ekonomîkî, hejmareke zaf ji xelkê wan deveran, kolberiyê dikin û bi kolberiyê nanê xwe dertînin.

Kolberî kareke pir metirsî û pir zehmet e li Rojhilatê Kurdistanê de ku pirsgirêkên gelek zêde bo xelkê afirandiyê.

Ew lêkolîn bi awayê baskirin û analîz û bi mifahwergirtin ji çavkaniyên pirtûkxaneyan, malperên internetî yên bi wec û lêkolîn li ser dîkomentan, cehdê dikin ku paşhatên polîtîkî-sosyolojîk yên diyardeya kolberiyê li Rojhilatê Kurdistanê bide nîşandan.

Netewên bê maf yên li ser sînor, û bi taybetî netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, em dibînin ku li nêzîkî sînoran di van salên dawî de, diyardeya civakî ya bi navê kolberî di wêjeya Îranê de, îro pirsgirêk û pirsêke civakî ye ku roj bi roj li vê diyardeyê tê zêdekirin û di van salên dawî de gelek mirovan di rêka kolberiyê de jiyana xwe ji dest dane.

Li wan deveran, piraniya ciwanên Kurd bêkar in, her çend xwendibe jî, rejîm bi sedema Kurdbûna wan kar

nade wan, eva jî basekî dinê ye ku rejîm bi çî şert û mercan kar dide Kurdan. Gelek kes neçar dimînin kolberiyê bikin û di nava meydanên mînan û gelek bi dijwarî û zehmetiyan, li nav kemînên hêzên rejîmê derbas dibin bona peydakirina pariyek nanê helal.

Revîna elîtan wate (noxbe) roj bi rojê zêdetir dibe û hejmara wan elît û pisporan ji Îranê ku bona peydakirina jiyaneke baştir ji Îranê direvin, heya ku bigihine xweşiya civakî, ewlehî, hêviya jiyan û aramiya derûnî û ewlehiya kar ji bo pêşerojek çêtir a zarokên xwe û di welatên Rojavayî de akincî dibin. Lêkolîn nîşan didin ku diyardeya Kolberiyê wekî pîvanek bandor li ser aliyên civakî heye û encamên wiha hene: Kêmbûna behreya takekesî, koçberî, piştguhavêtina rûmeta mirovan û têkdana baweriya malbatan.

Ji aliyê siyasî ve jî, encamên wekî: Xurtkirina heştê cudaxwaziyê û egera kêmbûna beşdariya siyasî, xwenîşandan û mangirtin û gelek encamên din dikare bi dû xwe ve bîne.

Herêmên sînor ji ber cîhê xwe yê taybetî yê erdnigarî û siyasî bi gelek krîznên aborî, civakî û çandî re rû bi rû ne; Û kolberî wekî yek ji rêkên peydakirina nanê, awayê jiyana dijware xelkê ye. Navçên sînorî, navçên herî bêpar in. Bê guman, Kurd li van deveran dijîn.

Bê guman, pirsgirêka kêmbûna kar û Pirsgirêkên aborî, bandorekî raştevxwe danaye ser aliyên cur bi cur ên jiyana gelê Kurd.

Kolberî diyardeyeke civakî ye ku îro li deverên sînorên Rojhilat, Bakur û Başûrê Kurdistanê heye. Faktorên cur bi cur ên weke pirsên civakî, aborî, siyasî, çandî bûne sedemê çêbûna diyardeyeke wiha li van deverên sînorî. Şêwaza jiyana mirovan li ser



bingeha pêdiviyên mekanî, demkî û pêşveçûnên teknolojîk û çandî ye, û xwedî reh, form û naverokên cuda ne. Encam ev e ku mirovên ku kareke wekî kolberiyê dikin, hewcehiyên xwe yên bingehîn jî nikarin dabîn bikin.

Di van salên dawî de, zêdebûna hejmara trajîdiyan gelek nûçe di derbarê rewşa jiyana kolberan belav bûn ku peyva kolberî kiriye peyva serdest di edebiyata Kurdistanê de. Kolberî diyardeyeke metirsîdar e ku mirov dikare bibêje ku ji ber feqîrî, şert û mercên aborî yên nebaş, nebûna pîşesazî û afirandina kar, belavkirina nevekhev a dewlemendiyê, pêşketina kêmiya mirovên li herêmên sînorî yên welêt têne hesibandin. Ne bi tenê mêr, lê jin û zarok jî di nav kolbran de têne dîtin, ku temenê wan piçûk û kêmin in û di bin giraniya jiyane de piştta wan çemiya ye, û ji hemû metirsiyan derbas dibe, ew bi deh kîlometreyan barên giran hidigrin.

Kuştina kolbran li Kurdistanê û di sir û seqemê de ku heya niha dehan trajîdiyaya sirêbirin yan kevtina bin reniyê û teqîna mînan û kevtina ji çiya û razên asê re, ev bûyer in ku kêmin rojên salê hene em şahidê wan nebin yan nebihîsin.

Bê guman heya wê rojê ku Kurd bindest be û heya wê rojê ku nekare qedera xwe bigre dest xwe, dê çarenivîsa gelê me ji ya niha heyî dijwartir be û ne tenê kolberî, belkî çendîniyadêyên dinê jî dê bibine para me Kurdan.



Nerîna Lîderan



“Pap Francis”:
“Nabe ji navê Xwedê wekî hêcet bona kuştin û terorîzmê bê bikaranîn”.



“John Kirby”:
“Piştî bi dawîhatina lêkolînan li ser êrîşa Eyn El-Esed emê dê bersiva wê êrîşê bidin”.



“Qeys Xez'elî”:
“Êrîşkirin li ser binkeyên Amerîkayê rewya û yasayî ye û em bi her êrîşeke Amerîkayê dê bersiveke bi hêz bidin”.



“Hesen Rûhanî”:
“Nabe nirxa çî tiştêkê bê hevahengiya stada aborî bê bilindkirin”.

Îran rêkvevtina Etomî naxwaze bombeyê dixwaze!



N: Eskender Ceiferî

Roja Pêncşemiyê 14ê Reşemeyê, Mihemdcewad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkvevtina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de ye ku welatên Berîtanya, Feranse û Almanayayê ragihandine ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Berî du mehan Donald Trump serkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dewsa xwe da Joe Biden dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkvevtina etomî bi Îranê re. di vê navberê de Rêformxwazên Îranê rêkvevtinê dixwazin, lê Spaha Pasdaran dibêje nabe rêkvevtinê bê kirin. Di raştî de armanca rejîma Tehranê berhevanîna bombeya etomî ye. Ew dem bi kar tînin û bi meyndina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzikî berhevanîna bombeyê dinbin. Zerîf di daxuyaniya xwe de ragihand ku sala 2021an êdî wek sala 2015an nîn e ku rêkvevtinê bê kirin. Niha êdî sala 1945an jî nîn e ku Civaka Navnetewî dewsa xwe da Neteweyî Yekbûyî, û tê de Amerîkayê ji bo hertim, mafê vêto yan jî redkirina biryaran stand. Beriya niha di serdema Donald Trump de hem Benjamin Netanyahu serokwezîrê Îsraîlê û hem jî Trump ragihandibûn ku rejîma Komara Îslamî piştevaniya terorê dike û herî zêde xelkê Îranê ji vê mijarê zirarê dike. Tekez jî kirin ku divê rê li ber Îranê bê girtin. Eger ew rejîm bibe xwedîya bombeya etomî, wê ji bo gtevahiya cîhanê bibe metirsiyeke mezin. Li gor daxuyaniya wê demê ya Koşka Spî, Trump û Netanyahu di

mijara dorpêçkirina Îranê ya di herêmê de nerîneke hevpar diyar kiribûn. Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiyê ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhevanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin. Komara Îslamî jî bersiva berpîrsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cîhan wan gûnehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymanî etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xweşt rêkvevtina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yê Ewropî ne. Tillerson got jî ku xelên rêkvevtinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cewad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrê derve yê welatên ku peymanî imza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyî Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevkerîne ya Donald Trump serkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye. Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji deşt bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nêdan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegehrînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran rêkvevtinê naxwaze. Îran hertim gefê li Amerîka û Îsraîlê dike û seyîd Ebdûlrehîm Musevî serfermandarê giştî yê çekdarên Îranê ragihandibû ku ewê Telavîv û Hayfayê bi erdê re bikin yek. Hesen Rûhanî serokomarê Îranê jî ragihand ku heke Amerîka ji rêkvevtina etomî vekîşe û jê poşman bibe, wê bedêleke giran bide û li gor nêrîna

rejîma Tehranê, vekîşîna Amerîkayê ji vê peymanê wê bibe sedema xercên mezin û ev ti fêdeyekê li amerîkiyan nake û wê zirareke mezin ji vî karî bibînin.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yê Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezaretê Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyanan bersiv nade ku çima Amerîka di imzekirina raportan de dudil e û sedem çî ne lê bi gotara Hesen Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yê aborî, gefê li rêkvevtinê dikin. Rêkvevtina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên ewropî hatibû imzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêmkirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin. Îsraîlê jî destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkvevtinê naxwazin. Beriya niha jî berpîrsên saziya Nehelana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropîyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yê Îranê demlîdest imze bike lê Trump li pey planeke din digere. Ji bilî berpîrsên bilind ên Îsraîlê, fermandarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkvevtinê bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike. Almanya, Berîtanya û Feransê ku rolele mezin di rêkvevtinê de hene, dibêjin bi meyndina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cîhanê bibe gef. Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyndina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pîzişkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cîhanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhevanîna bombeyê tene bikaranîn. Li bendê ye di rojên bê de, Îran armanca xwe ji bo berhevanîna bombeyê zelaltir nîşan bide û karvedanên biyanî jî xuyatir bibin.

Hevpeyvîna “Byzantine” ya Kurdî xirabrtir dibe



N: Ebdulazîz Qasim

Her ji destpêkirina pêvajoya diyaloga kurdî-kurdî, me dizanî ku wê astengiyên mezin bikevin di pêşiya vê pêvajoyê de, lê biraştî nedihat pêşbînîkirin ku ev diyalog dê bibe rengê ji rengên Dialogue Byzantine “Discusión bizantina”, hevdem ku her çiqas dem diçe wisa derfet jîdeşt diçin, herwisa hêvî û daxwazên gelê kurd ji bo siberojêke baştir sist dibin.

Roj biroj, nakokî di navbera herdu aliyên kurdî de (ENKS, PYNK) zêdetir dibin, ku ti wate ji bo dauştandinên di nabe wan de nemaye, nemaze ji aliyê rêveberiya PYD ku hêjî berdewamiyê dide li ser heman siyaseta xwe ya berê, û xuyaye ku heta aliyên gerantor “Amerîka û Fransa”, tevî kombûna şanda Amerîkiyan ya berî çendekî li gel partiyên kurdî ji bo destpêkirina civînan, lê xuyaye ku şanda Amerîkiyan heman pîtedana berê bi serxistina diyaloga kurdî-kurdî nadin.

Ji aliyek din mana ENKS di nava opozisyona alîgira Tirkîyê de, ew jî dibe sedema peydabûna nakokîyan, û dîtir partiyên kurdî guhdariya gazind û gaziya xelkê xwe nakin, lewra reşbînyek di nav civaka kurdî de peydabûye ji egera xemsarî û bêperisyariya partiyên kurdî yê bi xemsarî serederiyê ligel rewşa xirab ya gelê kurd û doza kurdî dikin.

Daxuyaniyên nerênî yê serkirdeyên partiyên kurdan reşbînyê çêdikin û bûne egera rawestandina danuştandinên kurdî-kurdî, di dema ku rêjîm bi opozisyona xwe ve li ser pîrsa kurdî yekdeng in û bi harîkariya herdu dewletên dagîrker (Tirkîya û



Îran) ligel hev tevî nakokiyên di navbera wan de kar ji bo jinavbirina miletê kurd û guhertina demografî li herêm dagîrkirî (Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê) dikin, ku rojane kiryar û tawanên dijemirov li dijî gelê kurd li ser destên artîşa tirkîyê û çeteyên wê nemaze li Efrînê tene pêkanîn, ku ligor hin amarên rêxistinên mafên mirovî ku guhertina demografî 80% li Efrînê û 100% li Serêkaniyê û Girêspî hatiye pêkanîn.

Rewşa mirovî ya li deverên kurdî heta li deverên di bin deştilatdariya PYDê de jî, bicarekî têkçûye, ku nan, pêdawîstiyên xwarin û ardû (sûtemanî) peyda nabin û bihayê dolar li hember wereqa Sûrî (lêre) gelekî bilind bûye, ku milet bîrsî û tihî bûye û ketiye di bin hêla hejariyê de, hevdem ku birêveber û serkordeyên partiyên kurdî zengîn û dewlemend dibin û bûne rengê ji mafiya siyasî.

Îro, herdu aliyên kurdî ENKS û PYNK û di nav wan de bi taybetî PYD berpirsyar in li hember rawestandina diyaloga kurdî-kurdî, herwiha divê ragihandina kurdî bi erkên xwe rabe ji bo nêzîkkirina aliyên kurdî û nabe nakokiyên kurdan zêdetir bibin û nabe xemsarî li ser qeder û çarenivîsa gelê kurd bibe û pêdivî ye ku her aliyek bi berpirsyariya dîrokî serederiyê ligel rewşa heştîyar ya miletê kurd û doza wê ya netewî wekî (niştiman û milet) bike û berevajî vê yekê ji aliyê miletê kurd wê nifret li van partiyên bibe û wê navên wan hetahetayê bikeve di zibldana dîrokê de.



Welatiyekî Kurd li bajarê Pîranşarê bi sedema teqîna mînê birîdar bû

Roja Sêşemî 12`ê Reşeme, cotyarek yê bi navê “Setar Ezherî”, xelkê gundê “Likbin” yê ser bi bajarê Pîranşarê, bi sedema teqîna mînê birîdar bû.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew welatî di dema cotyariyê de raştî Wê bûyerê hatiye.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand, ew welatî bo çareserîya pizîşkî bo yek ji nexweşxaneyên bajarê Pîranşarê hatiye vegu-haştin.

Hewdem di vê rojê de, fermandarê bajarê Qesraşîrîn ragi-handiye ku yek ji koçeriyên devera “Sumar”, bi sedema teqîna yek ji mînên bi cihmayî yên şerê di navbera Îran û Îraqê de, destê wî birîdar bûye.

Ew welatiye di dema çirandina bezên xwe de raştî wê bûyerê hatiye.

Herwisa di wê derheqê de, roja Duşemê 4`ê Reşeme, yek ji mînên bi cihmayî yên şerê di navbera Îran û Îraqê de li bajarê Qesirşîrîn, bû bi sedema vê yekê ku zarokekî temen 7 salî dest û lingê wî birîdar bibe.

Roja Şemî 25`ê Rêbendanê, zarokek bi sedema teqîna mînê li bexşa deşta Ebas ya ser bi bajarê Dêhloranê, destê xwe ji dest da.



Kavilkirina dariştanan li Kurdiştanê berdewam e

Dariştanên gundê “Bêzilê” yê ser bi ba-jarê “Serdeşt”ê ji aliyê kesên dijî zîngê ve hatine birîn û kargeha Rejîsaziyê di nava dariştanê de çêkirine.

Li wê cihê ku kargeha Re-jîsaziyê hatiye danîn heta darê ter jî hatine birîn û kirine rejî.

Welatiyan daxwaz kirine bi hevkarîya kesên jîngheparêz

pêşî ji wan kavilkariyane bigirin.

Hevdem xelkê gotiye ku hin kes hene ku ser bi rejîmê ne û ew zevî û dariştanên ku milkê giştî yê xelkê ne dagîr dikin.

Birîn û şewitandina dariştan-an li Kurdiştanê ji aliyê re-jîmê ve bi awayekî sîstmatîk kar bo têkirin.



Nebûna rûn di bajarên Kurdiştan û Îranê de pirsgirêk bo ser jiyana xelkê afirandiye

Nebû û desneketina rûn di bajarên Rojhilatê Kurdis-tan û Îranê de çendîn meh in ku berdewam e û xelk berde-wam bûna dabînkirina rûnê xwarinê di dorên kirîna rûn de disekin.

Pêka vîdiyoyekê ku di nav torên civakî de belav bûye, tê zanîn ku xelkê bajarê Urmiyê bûna kirîna rûnê xwarinê di doran de sekinîne, lê ew dor ne wekî carên dinê ye, belkî xelk bo bideştixistina rûn di-gel hev raştî pevçûnê hatine.

Eva di halekê de ye ku kar-bideştên rejîmê nebûn û kêmbûna rûn di bazarên Îranê de red dikin û dibêjin ku rûnê hewc di bazar de heye û ti pirsgirêka rûnê xwarinê me nîne.

Herwisa pirsgirêka nirxa mirîşkan jî hêj çareser nebûye û nirxek taybet bo nehatiye diyarî kirin, delalên bazar û firoşer bi xwe nirxa wan bi dilê xwe bilind dikin û rejîma Îranê jî ti kontrolê li ser wan nirxane nake.



Hunermendê netewî ê gelê Kurd Hesên Zîrek



N: Keyhan Mihemedînijad

Dengê ku hîn jî zîndî ye, dengê ku hîn jî gelê Kurd di mêjî û dilê xwe de diparêzin. Dengê resen, dengê gel, dengê evîndarî, dengî sew-daserî.

Wî ne di dibistanan de tîpek xwendibû û ne jî li cem çî mamostayekê dersa hunerî xwendibû û ne jî li çî akademiyeke hunerî ya awaz û mûzîkê de xwîndibû, ew hunermend û bilbilê Kurdistanê û dengê folklorê Kurdî bû, ev Hesên Zîrek e, Hesên Zîrek her bi raştî wekî nasnavê xwe zîrek bû û bi zîrekatiya xwe folklorê Kurdî parast.

Hesên Zîrek di sala 1921'an de li bajarê Bokana Rojhilatê Kurdistanê ji dayîk bûye. Ew her di ciwaniya xwe de wekî stranbêjekî deşt bi gotina stranên dîke.

Hesên Zîrek, bo kar û xebatê li gelek bajar û deverên Kurdistanê geriyaye, û li kuderê mabe gelek nekêşayê, nav û dengê wî belav bûye. Hesên Zîrek di 12 saliya xwe de Bokanê bi cih dihêle û diçe bajarê Seqizê.

Di 15 saliya xwe de dîsa wedigere Bokanê, car din ji bo karekirinê diçe bajarê Tewrêz û Tahranê.

Piştî midehekê diçe Başûrê Kurdistanê û li bajarê Silêmaniyê li taxa Dergezê bi cih dibe. demekê jî diçe Kerkûkê û di dawiyê de di sala 1953'an de diçe Radyoya Bexdayê ya Kurdî û bi dehan stranên kevnan ên Kurdî di radyoya Bexdayê de tomar dîke.

Hesên Zîrek xwediyê dengê resen li 14'ê meha Tebaxa

1959'an li ser daxwaza radyoya Kurdî ya Tahranê wedigere Îranê û li Tahranê kar û xebatên mûzîka Kurdî dîke. Ew carna jî diçe Tewrêzê û li radyoya Tewrêzê jî stran digot.

Ew her li radyoya Tehranê de digel "Midiya Zend" nasyar dibe û jiyana hevbeş pêk tînin û encama wê zewacê du zarok, yê bi navê Mehtab û Arezû lê çêdibin. Hesên Zîrek sala 1960'an, ber bi bajarê Kevnarê Kirmaşanê ve diçe û piraniya stranên xwe di radyoya Kirmaşanê de bi hûstatiya hunermendê mezin ê Kurd, "Mucteba Mîrzade" tomar dîke ku nav û dengê hunera Hesên Zîrek zêdetir belav dibe.

Hesên Zîrek ê navdar, piraniya stranên xwe bi zaravayê soranî vehûnandiye, lê carna bi zaravayên din ên Kurdî û bi zimanê Farsî û Tirkî jî stran gotine û wî heta radeyekê jî zimanê Erebbî dizanî.

Yek ji taybetmendiyan berçav ên Hesên Zîrek, komkirina gencîneyek ji huner û awaza Kurdî ye ku bi dengê wî hatiye gotin û Kurdan û hunermendên Kurd mifah jê wergirtine.

Hesên Zîrek li gelek gund, dever û bajarên Kurdistanê geriyaye, wî êş û zehmetiyên gelê Kurd bi çavên xwe dîtîye û aniye ziman. Hesên Zîrek reseniya Kurdî parastîye û ji herkesê re stran gotiye. Ji bo vê yekê ye ku tev gelê Kurd jî dengê Hesên Zîrek hez dîkin û jê guhdarî dîkin.

Hesên Zîrek piraniya jiyana xwe di nav avarebûnê de derbs kiriye û wî ne li Îranê ne jî li Îraqê çî xweş nedîtîye.

Ew li Bexdayê hatiye binçavkirin û bo heyama 18 mehan di girtingeha Îraqê de bûye û nêzî 6 mehan îşkence dîtîye.

Rejîma Îranê jî her bi wî awayî gelek pîrsgirêk bo



Hesên Zîrek anîne pêş û rê nedane wî ku cardin di radyoya Tehranê de kar bike. Piştî dezgehên ewlehî û asayîşî yê Îranê wî digrin û gelek jî îşkence dîkin. Hesên Zîrek gelek bi awayê zîrekane û bi selîqeya xwe stranên bîhaniyan wergêranê Kurdî kiriye û bi şewazeke resen a Kurdî vehûnandiye. Bo mînak strana Xenîlî Şuwayî Şuwayî yek ji stranên naskirî yê Um Kulsumê ye, Hesên Zîrek awaza wê liber kiriye û bi Kurdî gotiye. Hesên Zîrekê navdar kesek bû ku ji berxwe de stran difirandin û her kesekê li ser her tiştêkê daxwaz jê kiriba dem û deşt digot.

Tê zanîn ku carekê Fatime Zergerî keçek stranbêj a ku di serdemê deştîlatdariya Şah de stran digotin, li bajarê Tewrêzê konsêrta wê hebûye û wê demê jî Hesên Zîrek li Tewrêzê bûye û bo konsêrta wê çûye. Fatime Zergerî jî awazekê bi strana guldirmenî guldir deşt pêdîke.

Amadebûyên konsêrtê bi çepiklêdan cardin daxwazê jê dîkin ku wê strana xwe dúbare bike. Fatime Zergerî jî daxwazê dîke ku demekê bêhna xwe wede û cardin bê dúbare bêje, Hesên Zîrek bi derfetek baş zanî û xwe gihande cihê bêhnwedana wê jina stranbêj, û jêpirsî tu kî yî? Hesên Zîrek jî bersiva wê da û got, ez Hesên Zîrek im, ez daxwazê ji te dikim, ew strana ku te a niha got, bihêle em bi hev re bi Azerî û Kurdî bêjin, Xanima stranbêj got, çawa tiştêk wiha dibe? ez mehek e kar li ser wê awazê

û stranê dikim, tu çawa dikarî wiha zû helbeşa Kurdî têkelê wê awaz û strana min bikî? Hesên Zîrek her çawa be karî wê razî bike û herdu hatine ser sitêycê û bi vî awayî stran, bi Kurdî û Azerî pêşkêşê amadebûyan kirin, û xelkê amade bi çepiklêdan ew pêşwazî kirin.

Hesên Zîrek gelek starên nîştimanperwerî û netewî gotine û di strana xwe "Ey Nîştiman" de mehta bejin û bala Kurdistanê û pêşmerge dîke.

Hesên Zîrek, stranbêjê herî xebatkar ê netewa Kurd e, ku bi sedan stran li radyo û televîzyonan de xwendîye û tomar kiriye.

Hesên Zîrek, dengê resen û xezîna awazên Kurdî yê folklorî, li 26ê Hezîrana 1972an de, li temenê 51 saliyê de li bajarê Bokanê xatir xwe ji mûzîka Kurdî xwaşt û çû ser dilovaniya Xwedê. Wî li pey xwe ve arşîveke hunerî ji bo netewa xwe bi cih hêla, ku bûye çavkaniyeke dewlemend bo hunera resen ya gelê Kurd.

Piraniya berhemên Hesên Zîrek di arşîva enstîtûyên Kurdî û Erebbî û Farsan de hatine parastin. Hesên Zîrek berî ku biçe ser rehma Xwedê, wesiya kiribû ku wî li Çiyayê Nalesîkê veşêrin û li ser kêla tîrba wî wiha were nivîsandin: "Zîrek zor kird xizmetî huner Jînit le pênav huner birde ser Rojgarit satê be bê xem nebû Belam le huner hîçit kem nebû".

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Raporek li ser kuştina jinek li Urmiyê li ser pirsar namûsî

11 roj beriya niha, jineke 38 salî, xelkê gundê “Badikî” yê ser bi bajarê Urmiyê, ya bi navê “Ezîze Heqî`iyûbî”, dayîka 4 zarokan li ser pirsar “namûsî” ji aliyê mêrê xwe ve hate kuştin.

Mêrê wê jinê yê bi navê “Girman Derwîşî”, jina xwe ji rêya xendiqandinê ve kuşt.

Çavkaniyên Kurdpayê ragihandine ku: “Girman Dervîşî” tûşbûyê madeyên hişber “Şîşe”yê bûye û bi şik û gumana “namûsî” jina xwe xendiqandiye.

Cînarên wê malbatê di civînekê de digel Kurdpayê ew şik û gumana “Girman Derwîşî” red kirine.

Termê wê jinê bo tewawkirina lêkolînê bo pizîşka yasayî veguhaştine û heya niha termê wê radeştê malbata wê nehatiye kirin.

Herwisa “Girman Derwîşî” reviyaye û heta niha nehatiye binçavkirin.

Dibe bê gotin ku gundê “Badikî” yek ji gundên nêzî bajarê Urmiyê û li qirax wî bajarî ye ku bi devereke deştperenegihîştî ya civakî tê naskirin.

Ew duhemîn “qetla namûsî” li heyama yek mehê derbasbûyî li bajarê Urmiyê ye.

15`ê Rêbendanê, “Işret Nîkxûyî”, keça Cimşîd, 28 sale ya xelkê gundê “Gengeçîn” li devera “Soma û Biradoşt” a girêdayê bajarê Urmiyê, li ser pirsar namûsî ji aliyê kurmamên wê ve bi berdana benzîne agir berdanê û canê xwe ji deşt daye.

Ji derheq qetila jinan, dem ku kuştina jinan bi palneriya paraştina abirû û şerefa malbatî be, diçe çarçêveya “qetlên namûsî”, haletên wekî; Xwedûrgirtin bo pêkanîna jiyana hewbeş ya bi zorê, qurbanîyên deştêjiya cinsî, telaq wergirtin, peywendî digel aliyên beraber, xweparaştin ji qise û dab û nerîtên malbatî û..., dikare şeref û abirûya malbata xwe “lekedar” bike û eva jî sedemek e bo “qetlên namûsî” ji aliyê bikujan ve.

Pêka amarên tomarkirî li “Navenda Amarî ya Saziya Mafê Mirov a Kurdpa”ê, ji deştpeka sala 1399an ve heta niha 7 halet ji “qetlên namûsî” li Kurdistanê qewmî ne.

Berhevanîn: Evîn Mîstefazade

Welatîyekî xelkê bajarê Seqizê bi sedema teqeya hêzên leşkerî hate birîndarkirin

Sibêdeha roja Înê 15`ê Reşeme, welatîyekî Kurd yê bi navê “Qubad Navxasî” xelkê gundê “Masyerî Kon” yê ser bi bajarê Seqizê, bi teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê bi awayekî dijwar hate birîndarkirin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê li ser sînorê “Navxan” li nêzîk gundê “Beştam” yê ser bi devera Serşîw ya girêdayê bajarê Seqizê, teqe ji wî welatîyê kirine.

Hêzên leşkerî yê hikûmeta Îranê, bi gumana “helgirtina tiştên qaçax”, teqeya raştê ji wî welatîyê kirine.

Ew welatîye, li encama teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê bi awayekî dijwar birîndar bûye û bo tedawiya pizîşkî bo nexweşxaneyê Tewrêzê hatiye veguhaştin.

Heta niha me`imûrên hikûmetê, îzn nedane malbata “Qubad Navxasî” ku li nexweşxaneyê kurê xwe bibînin.

Îman Ebdî bi danîna barimteyê hate azadkirin

Îro Şemî 16`ê Reşeme, welatîyekî Kurd yê bi navê “Îman Ebdî” yê xelkê bajarê Mihabadê, bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Urmiyê hate azadkirin.

Ew welatîyê Kurd roja Sêşemî 28`ê Rêbendanê piştî bi dawîhatina lêpîrsînê ji girtîgeha Îtila`ata Spahê li bajarê Urmiyê bo girtîgeha wê bajarî hatibû veguhaştin.

Ew welatîye roja Şemî 20`ê Befranbarê hewdem digel deştpeka pêla binçavkirina welatîyên Kurd li Kurdistanê hatibû binçavkirin û bo lêpîrsînê bo girtîgeha El-Mehdî a bajarê Urmiyê hatibû veguhaştin.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatîyê Kurd de hatiye sepandin ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (393)

Wêneyên bi dawîhatina dewreya destpêkî

